



## **EM PERWERDEHIYA BI ZIMANÊ DAYIKÊ DIXWAZIN!**

Mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê yek ji mafên herî bingehîn ên mirovan e û ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatiye pejirandin û li ser hemû dewletên endamên NY'yê bi awayekî fermî hatiye ferzkirin. Lê belê li Tirkîyeyê ev maf ji bo gelê Kurd, Ereb, Ermenî, Suryanî, Çerkes, Laz tê xesbkirin. Ji xeynê zimanê Tirkî hemû zimanên cuda yê ku li ser vê axê tên axaftin bi awayekî sistematîk tên bişaftin û qedexekirin. Ji ber polîtîkayên asîmîlasyonê li Tirkîyeyê gelek ziman ber bi wendabûnê ve diçin. Li gor Atlasa Zimanên di bin Xetereyê de ya UNESCOyê, li Tirkîyeyê 18 ziman heta niha hatine tunekirin an jî di bin xetereya tunebûnê de ne. Ji van zimanan yek jî Kirmanckiya Kurdî ye.

Bişaftina zimanan, polîtîkayên tunekirina çandî, sêcekî li dijî nirxên mirovahiyê ye. Lê Tirkîye biryarên navneteweyî yê ku zimanan diparêzin bi cih nayîne û bînpêkirina van mafan îro hê jî didomîne.

Weke Partiya Gelan a Wekhevî û Demokrasiyê (Partiya DEMê) em bi minasebeta 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî careke din bang li saziya we û hemû saziyên navneteweyî dikin ku hûn berpirsariyên xwe bînin cî. Divê hûn lijneyekê bişînin Tirkîyeyê û derbarê Tirkîyeyê de li ser bînpêkirinên mafên zimanî vepirsînekê bidin destpêkirin. Divê li Tirkîyeyê di serî mafê statuya zimanê Kurdî (Kurmancî-Kirmanckî) û mafê statuya zimanên Erebî, Ermenkî, Suryankî, Çerkesî, Lazî, Romanî, Boşnakî û zimanên din bê dayîn. Divê dewleta Tirkîyeyê şert û mercên mafên bingehîn yê navneteweyî pêk bîne û li gor van peymanan tevbigere. Divê Dewleta Tirkîyeyê şerhên ku danîne 3 xalên (xalên 17, 29 û 30) Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekgirtî rake û berpirsariyên xwe yê vê Peymanê bi cî bîne.

Em weke Partiya DEMê 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî pîroz dikin.

**Tulay Hatimogullari – Tuncer Bakirhan**

**Hevserokên Giştî yê Partiya DEMê**